

Bi gelemperî belavkirin û vegirtin li wîlayeta Kalmar

Bi hêzek bilind belavkirinê nexweşyê li pêş me ye. Ji ber vê yekê, divê em berdewam bikin û bişopînin şîretên Desteya Tenduristiya Giştî.

Li wîlayeta Kalmar, naha bi gelemperî belavbûnek giştî ya vegirtinê heye. Vegirtin û belavkirin li hemî şaredariyan tînin dîtin û mirov nizanê ka kî yê pêkevê. Doktorê enfeksiyonê bawer dike ku hêzanyê nexweşyê - gava ku bi piranî nexweş bûne - li pêş me ye. Kengî tê, kes nizane.

Dema ku belavkirin gihîşt hêza jor, girêdayî ye ka ko her kes çawa bi kar tîne şîretan li ser parêzbûne xwe û kesên din ji vegertinê nexweşyê. Ew taybetî girînge ku ne her kes bi hev ra nexweş bibin. Wê hingê karmendên li nexweşxaneyan nikarin alîkariyê bikin li kesên ku pir alîkariyê dixwazin.

Ana Norlén rêvebirê amadebûna li wîlayetê ye. Ew berpirsiyarê xebata li ser krîzan e. Ew ji her kesê dixwazê ku baldar bin.

- Di girupê mezin de, bi hev ra kom nabin, ew dibêje. Ji hev dûr bimînin û rêwîtiyê nekin!
We divê em bi mezinan re jî baldar bin.

Ew dibêje pir girîng e ku em ji parastina xwe westa nabin.

- Divê em hemî bi hev ra bi mehan berdewam bikin. Jê hatî û bihnfereh bin!

Medya bi gelemperî li ser enfeksiyonê dinivîsin. Lê ew bi piranî li ser rewşa Stockholmê ye. Li wir, ji demek dirêj ve belavbûna gelemperî ya enfeksiyonê heye. Pir kes di yekîneyên lînêrînê (intensivavdelningar) da ne (IVA) û pir jê mirin. Lê niha Desteya Tenduristiya Gel dibêje ku dibe enfeksiyon gihîştîye hêza xwe li Stockholmê. Yê ku dimirin û nexweş dibin her dem naha wek hev bi hejmarê.

Wîlayeta Kalmar li dû Stockholmê ye û li wîlayeta me de êşa enfalê ne gihîştî hêza dawî. Ji bo ku bizanbin ka li wîlayeta Kalmar çi dibe, divê em guh bidin Lêpîrsîna Nexweşiyên Enfeksiyonê li herêma Kalmar, û li ser ragihandina medya ya li ser şaredariya xwe.

- Her dem amade bin ka rewş li wîlayeta Kalmar çawa ye. Ji ber ne wek rewşa Stockholmê ye. Û alîkariya bikin û bêjin ji hev ra, dibêje Ana Norlén.



Tevkariya krîzê wîlayeta Kalmar, tevkarîyek di navbera hemû şaredarên wîlayetê ye, Navçeya wîlayeta Kalmar, Desteya Rêvebiriye wîlayeta Kalmar û hemî rayedarên din yê wîlayetê de hene.

 facebook.com/krissamverkan.kalmar
facebook.com/vastervikskommun



VÄSTERVIKS
KOMMUN